Ronahî
şopdara rastiyê ye
www.ronahi.net/ku/ Hejmar: 486 11- Mijdar - 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

# Li Şehbayê spora jin xwe birêxistin dike



**Li herêma Şehbayê xebatên rêxistinkirina sporê heta astekê hatiye. Yekîtiya Werzîşê xebatên avakirina tîmên taybet yên jinan berdewam dike. Di encama van xebatan de Tîma Berxwedan û Tîma Til Rifeh hatin avakirin. Endamê Rêveberiya Yekîtiya Werzîşê Nezîr Ehmed Kor Misto derbarê mijarê de diyar kir ku weke hemû qadan jin wê di xebatên sporê de jî pêşengiyê bikin.**



**Idrîs HENAN**

Yekîtiya Werzişê bi destek û perspektîvên Desteya Ciwan û Werzişê, demeke li ser amadekirina tîmên taybet ên jinan dixebite. Di encamê de di mîhrîcana Dengvedana Efrînê de du tîmên fotbolê yên jinan (tîma Berxwedan û Tîma Tir Rifet) hatin avakirin.

JIN DI SPORÊ DE JÎ PÊŞENG E

Endamê Rêveberiya Yekîtiya Werzişê Kaptên Nezîr Ehmed Kor Misto girêdayî mijarê ev agahî bi me re parve kir: Jina Kurd di pêvajoya Şoreşa Rojava de isbat kir ku ew hêza pêşeng a civakê ber qezencên mezin ve dajoye ye. Di bin siya Rêveberiya Xweser de jin pergala demokratîk a gelan bi rê ve dibe. Çawa ku di hemû aliyan de jin xwedî rola sereke ye, di sporê de jî pêşeng e. Kaptên Nazîr bi bîr tîne: Li Efrînê gelek tîmên cuda yên jinên ciwan hebûn. Li ser navê Efrînê beşdarî gelek kûpa û pêşbirkên sporê yên li ser asta Efrîn, Rojava û Kurdistanê bibûn. Di hemûyan de jî xwedî radeyên zorbaş bûn.

**JIN XWEDÎ KEDA ENCAMGIR E**

Endamê Rêveberiya Yekîtiya Werzişê Kaptên Nezîr behsa serdema piştî koçberiya bi zorê ya gel û werzişvanên Efrînê kir û ev tişt anî ziman: Werziş jî nola hemû aktîvîteyên civakî bi dagirkirina Efrînê re bi bandor bû. Werzişvan û werzişkerên Efrînê fena gelê xwe li Şehbayê tevî malbatên xwe bi cih bûn. Yekîtiya Werzişê û Desteya Ciwan û Werzişê çawa ku li Şehbayê bi cih bûn, li ser endamên xwe geriyan û ew komî ser hev kirin. Bi vî awayî, me tîmên xwe ji nû ve ava kirin. Kaptên Nezîr di dewama axaftina xwe de got: Ta niha du sê tornoveyên sporê li Şehbayê hatine lidarxistin. Mîhrîcana Dengvedana Efrînê jî çalakiya serencam a ked û karê ciwanên Efrînê ye.

**TÎMÊN JINAN TÊN AVAKIRIN**



Derbarê herdu tîmên jinan ên fotbolê de Kaptên Nezîr wiha dirêjahî da gotinên xwe: Mehek zêde em li ser amadekirina herdu tîman dixebitin. Hema beriya mîhrîcanê bi 15 rojan herdu tîman dest bi werzişkariyê kirin û demildest beşdarî sêyemîn roja mîhrîcana Dengvedana Efînê bûn. Kaptên Nezîr tekez kir: Tîmên jinan jî girêdayî Yekîtiya Werzişê ne. Wê heftane du rojan perwerde û werzikariya xwe bibînin. Kaptên Nezîr destnîşan kir: Piştî vê mîhrîcanê hewldan heye tîmên jinan li Kampa Serdem, Babinis û gundên dîtir ên Şehbayê bên avakirin. Wê dabînkirina pêdiviyên hemû tîman jî li ser milê Yekîtiya Werzîşê be.



**ŞOREŞA ROJAVA HER SERKEFTIN E**

Endamê Rêveberiya Yekîtiya Werzişê Kaptên Nezîr Ehmed Kor Misto di dawiyê de got: Şoreşa Rojava her em fêrî serkeftinan kiriye. Avakirina tîmên jinan li Şehbayê destkeftiyeke Şoreşa Rojava ye. Wê ciwanên me bi çalakiyên xwe yên sporê, bi ruhê Berxwedana Serdemê ji nû ve xwe birêxistin bikin û wê di mewziyên rizgarkirina Efrînê de cihê xwe bigirin.

Hêjayî gotinê ku Mîhrîcana Dengvedana Efrînê di bin diruşmeya (Ciwanên şoreşger û gelê niştimanperwer serî hildin, Efrîn li benda me ye) li Şehbayê çar rojan dewam kir. Di mîhrîcanê de li kêleka çalakiyên spor û lîstikên gelêrî pêşbirkên zanistî, helbest, stran, govend, şano, çandina daran, pêşbirka xwarinê û axaftin hebûn.

# Zivistan hat, koçerên li Zozanê Feraşînê vedigerin

Koçerên ji bo çêrandina heywanên xwe çûbûn Zozanê Feraşînê, vedigerin.

Koçerên li navçeya Silopiya û Hezexê yên Şirnexê ji bo çêrandina heywanên xwe çûn zozanan, bi hatina zivistanê re vedigerin. Koçerên ji havînê ve çûn Zozanê feraşînê ya li sêgoşeya Şirnex, Colemêrg û Wanê ye, piştî rêyeke 4 rojan daketin Bêşebabê. Koçer di rêyên bi qeraç de bi rojan dimeşin.

Koçer Tahir Işik, diyar kir ku ji



meha Gulanê ve ew çûne Zozanê Feraşînê. Tahir, destnîşan kir ku 15 sal in ew di heman rêyê de diçin û tên û ji ber ew li Zozanê Feraşînê sewalvaniyê dikin kêfxweş in. Tahir ku ji bo Zozanê Feraşînê dibêje "Li cîhanê cihê herî xweş", diyar kir ku ji ber operasyonên leşkerî ew carinan bi zor û zehmtiyan re rû bi rû dimînin. Tahir, anî ziman ku şert û merc çi dibin bila bibin ew ê sala bê jî biçin zozanan.

Nûreddîn Işikê 56 salî ku ji zarokatiya xwe ve koçertiyê dike, anî ziman ku ew bi berên heywanan debara xwe dikin. Nûreddîn, diyar kir ku ew ê biçin deştên li hêla Silopiyayê û ji ber ew koçertiyê dikin ew kêfxweş in...*MA*



Ronahî
şopdara rastiyê ye
www.ronahi.net/ku/ Hejmar : 486 11- Mijdar- 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

## HPG'ê li Agirî û Colemêrgê lê da: 19 leşker hatin kuştin



Gêrîlayên HPG'ê li bajarên Agirî û Colemergê derbên giran li artêşa Tirk xistin. Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê daxuyaniyek weşand û diyar kir di encama çalakiyên gerîlayan de li Bazîdê herî kêm 10, li Çelê û Geverê jî 9 leşkerên Tirk hatin kuştin.*R-2*

# PKK GEL E

**Dewletên Yekbûyî yên Emerîka bi deh salane ji bo berjwendiyên xwe yên siyasî û aborî piştgiriya şerê qirêj yê dewleta Tirk ya li dijî gelê Kurd dike. DYE bi salane di vê mijarê de tekoşîna gelê Kurd ya mafdar û daxwazên gelê Kurd yên azadiyê ji nedîtîve tê.**

### BIRYAR LI DIJÎ ÎRADEYA GELÊ KURD E

Meclîsa Giştî ya Partiya Yekîtiya Demokratîk PYD'ê li ser biryara rêveberiya DYE'yê ya li ser 3 rêveberên PKK'ê daxuyaniyek da û diyar kir ku biryara DYA'yê bi kêrî rêxistinên terorê; DAÎŞ, El Nûsra, Hûras El Dîn û Partiya Îslamê ya Turkîstanê yên li Sûriyeyê tê ku ev rêxistin fermanê ji Enqereyê digirin. PYD'ê got, "Ev biryara li dijî PKK'ê, îradeya gelê Kurdistanê dike hedef." *R-4*

### DIVÊ DYE JI BIRYARA XWE VEGERE

Meclisa Partiya Kesk a Kurdistanê derbarê biryara DYA'yê de daxuyaniyek weşand û DYA`yê xwest ku ji biryara xwe ya derbarê her sê rêveberên PKK`ê de vegere û ji ber sûcên li dijî gelê Kurd kiriye, hesabê ji dewleta Tirk bixwaze. Partiya Kesk wiha got, "biryarên bi vî rengî nakevin xizmeta ewlehî û îstikrara Rojhilata Navîn." *R-2*



### DIVÊ DYE DEV JI HELWESTA DIJ KURD BERDE

Koordînasyona Kongreya Star bi daxuyaniyeke nivîskî biryara Emerîkayê ya derbarê 3 rêveberên PKK'ê de şermezar kir. Koordînasyona Kongreya Star wiha got, "Dost û dijmin dizanin ku dewleta Tirk xwediyê DAIŞ, El-Qaîde û komên terorîst ên din e. Divê tavilê Emerîka dev ji helwesta xwe ya li dijî gelê Kurd berde û biryara xwe li ber çavan derbas bike." *R-2*

### PKK'Ê JI BO ÊZIDIYAN SEDAN ŞEHÎD DA

Biryara DYA'yê ya li ser 3 kadroyê pêşeng ên PKK'ê li Şengalê jî hate şermezarkirin. Sazî, meclîs û rêxistinên li Şengalê diyar kirin ku PKK'ê di ber axa Êzidiyan de bi sedan şehîd daye û gotin, "Ev biryar wê têkoşîna me qels neke, wê bibe sedem ku têkoşîna me xurtir bibe. Ev biryar wê bi kêrî dijminên gelê Kurd bi taybetî dijminên civaka Êzidî were." *R-5*

### BIRYARA DYE XIZMETA TERORÊ DIKE

Serokê Akademiya Siyaset û Ramana Demokratîk Dr. Fayîq Gulpî biryara Amerîka ya li dijî 3 pêşengên Kurd şermezar kir û got; "Ev biryar xizmeta terorê dike, divê hemû gelê Kurd û azadîxwaz li dijî vê biryarê dakevin kolanan." Gulpî da zanîn ku hatiye belge kirin ku Tirkiye pistgirya çeteyan dike, lewma divê Amerîka bizanibe ku ev biryar li dijî xelkê Emerîka ye jî. *R-4*

## Divê jin zêdetir xwe bi rêxistin bikin



Hevseroka Meclisa Rêveber a TEV-DEM'ê Zelal Ceger li Kampa Serdem a Şehbayê tevlî civîneke ku bi dehan jin lê amade bûn, bû û rewşa siyasî ya herêmê û Sûriyê nirxand. Zelal diyar kir ku hêzên derve hê zêdetir aloziya Sûriyê kûr dikin û da zanîn ku divê jin xwe ji bo berxwedan û têkoşînê amade bikin û xwe hê zêde birêxistin bikin. *R-3*

## QSD`ê serçeteyekî DAIŞ`ê girt



Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya QSD`ê ragihand ku Yekîneyên Antî Teror ên girêdayî QSD`ê, şeva pêncşemê bi alîkariya balafirên Koalîsyona Navneteweyî yek ji fermandarên rêxistina DAIŞ`ê ya teror li nêzî Reqayê girtine. QSD'ê diyar kir ku demên pêş de, wê debarê hûrguliyên nasnameya serçeteyê DAIŞ`ê ku hatiye girtin, agahiyan parve bikin. *R-2*

## Tirkiye êrîşî destkeftiyên gelan dike

Seroka Partiya Pêşerojê ya Sûriyê a şaxê Minbicê Fetûma Şeriq derbarê êrîşên dewleta Tirk ên li ser Bakurê Sûriyê diyar kir ku Tirkiye bi piştgiriya hêzên navneteweyî êrîşî gelên Bakurê Sûriyê dike û got: "Tirkiye ne li dijî terorê li dijî destkeftiyên gelan şer dike û piştgiriyê dide çeteyan." *R-3*

## "Keçên Rojê" li 180 sînemayan tê nîşandan

Fîlma ''Keçên Rojê" ya Derhênera Fransiz Eva Husson li 180 sînameyan tê nîşandan. Derhênera Fransiz Eva Husson diyar kir ku jinên Kurdan ti caran serê xwe netewandine, teslîm nebûne û li gel pergala zextkar û paşverû jî bi hêzeke derasayî û azaweriya têkoşînê li ber xwe dane. Husson got, "Min xwest bi vî filmî vê hêzê, vê azweriyê û berxwedanê nîşanî cîhanê bikim." *R-7*

## Avakirina Kampa Ziyaretê bi dawî dibe



Ji ber êrîşên dagirkeriyê yên li ser Efrînê bi deh hezaran welatiyên Efrînê neçar man ji Efrînê derkevin û li Şehbayê bi cih bibin. Heta niha gelek kamp ji bo Efrîniyan hatine ava kirin. Şaredariya Gel a Şêrawa bi hevkariya Desteya Rêveberiyên Herêmî û Şaredariyan li gundê Ziyaretê kampeke din ava dikin. Tê payîn ku kamp di nava du hefteyan de bi dawî bibe. *R-6*

## Bi tecrîdkirina Ocalan civakê jî tecrîd dikin

Tecrîda girankirî ya li ser Rêber Ocalan dewam dike. Parlamenterê HDP'ê Omer Ocalan diyar kir ku bi tecrîdkirina Rêber Ocalan civak tê tecrîd kirin û da zanîn ku tenê Ocalan dikare rê li ber şerê Rojhilata Navîn bigire. Omer Ocalan got; "Ji bo bidawîkirina tecrîdê çi ji destê kê tê divê bike." *R-4*

## Derbarê DAIŞ'iyên girtî de civîn hat lidarxistin

Buroya Têkiliyên Derve ya Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi şandeyeke dîplomasiyê ya Emerîkayê re li ser rewşa çeteyên DAIŞ'î yên li cem QSD'ê girtî roja 7'ê Mijdarê li hev civiyan. Hate diyar kirin, di civînê de hatiye nîqaşkirin ku divê çareseriyeke guncaw ji bo çeteyan û malbatên wan were dîtin. *R-5*

Kî terorîst e? R-4
Encam topa gin- R-5
Tirsa Mirinê R-3

# QSDê serçeteyekî DAIŞê girt

**Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya QSD`ê ragihand ku Yekîneyên Antî Teror ên girêdayî QSD`ê, şeva pêncşemê bi alîkariya balafirên Koalîsyona Navneteweyî yek ji fermandarên rêxistina DAIŞ`ê ya teror li nêzî Reqayê girtine. QSD'ê diyar kir ku demên pêş de, wê debarê hûrguliyên nasnameya serçeteyê DAIŞ`ê ku hatiye girtin, agahiyan parve bikin.**



Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya QSD`ê eşkere kir ku di encama çalakiyeke taybet de, yek ji fermandarên rêxistina DAIŞ`ê ya teror hate girtin.
Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya QSD`ê nûçeyek weşand û tê de ragihand ku Yekîneyên Antî Teror ên girêdayî QSD`ê, şeva pêncşemê bi alîkariya balafirên Koalîsyona Navneteweyî yek ji fermandarên rêxistina DAIŞ`ê ya teror girt.
Navendê eşkere kir ku di encama çalakiya taybet de serçeteyê DAIŞ'ê li nêzî bajarê Reqayê hate girtin.
Navendê ragihandin û Çapemeniyê ya QSD'ê diyar kir ku demên pêş de, wê debarê dateyên nasnameya fermandarê rêxistina DAIŞ`ê ya teror ku hatiye girtin, agahiyan parve bikin.

## Li herêma bêçek 22 çeteyên Tirk hatin kuştin



Di êrîşa roja 7'ê mehê de ku hêzên rêjîma Sûriyê li herêmên bêçek li gundên bakurê Hemayê li dar xist, 22 çeteyên Tirkiyê hatin kuştin.
Çavkaniyên Sûriyê yên mafên mirovan diyar kir ku hêzên rêjîma Sûriyê êrîşî cihên çeteyên Fesîl Ceyş El-Ize li herêma El-Letmanê li gundên bakurê Hemayê kir, şerekî giran rû da û di encamê de 22 çete hatin kuştin.
Çavkaniyan da zanîn ku ji destpêka ragihandina herêma bêçek ve ev hejmar a herî zêde ye.
Her wiha hate zanîn ku di şer de kesên windabûyî hene û heta niha lêgerîna li kesên winda dewam dike.

## DYE'yê Iraq ji bo 45 rojan li derveyî ambargoyê hişt



DYA'yê, Iraq ji bo 45 rojan li derveyî ambargoya li ser Îranê hişt. Bi vî awayî eşkere bû ku muafiyeta ji ambargoyê ne mayînde ye.
Seferatxaneya Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê (DYA) ya li Bexdayê ragihand, wan Iraq ji bo 45 rojan li derveyî ambargoya li ser Îranê hiştine ku dikare heta wê wextê gaza xwezayî jê bikirre.
Seferetxaneyê di hesabê xwe yê Facebookê de dîmenek weşand û ev peyam da: "Ji bo Iraq karibe ji Îranê gaza xwezayî bikire, DYA'yê ji bo 45 rojan ew li derveyî ambargoyê hiştiye."
Iraq, ji bo sotemeniya santralên elektrîkê peyda bike ji Îranê gaza xwezayî dikirre.
Dîrektorê Plansaziya Polîtîkayan a Wezareta Karên Derve ya DYA'yê Brîan Hook eşkere kiribû ku 5'ê Mijdarê DYA'yê Iraq li derveyî ambargoya li ser Îranê hiştiye.

## HPG'ê li Agirî û Colemêrgê lê da: 19 leşker hatin kuştin



Gerîlayên HPG'ê li Bazîdê derba giran li artêşa Tirk xistin. Di çalakiyê de herî kêm 10 leşker hatin kuştin, zêdeyî 10 leşker jî birîndar bûn. Li Çelê û Geverê jî di çalakiyan de 9 leşker hatin kuştin.
Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê daxuyaniyeke nivîskî weşand û li ser çalakiyên gerîla yên li Bazîd, Çelê û Geverê ev agahî da:
"Di çarçoveya Pêngava Serketina Şoreşgerî de hêzên me 8'ê Mijdarê saet 17'an li navçeya Bazîd a Agiriyê li dijî artêşa TC a dagirker a li ser girê Birnê Reş çalakiyek pêk anîn. Ji cihekî nêz ve li leşkerên li ser gir xistin û di encamê de 3 stargeh û 2 çeper rûxandin. Di çalakiyê de 10 leşker hatin kuştin, zêdeyî 10 leşker jî birîndar bûn.
Hêzên me roja 8'ê Mijdarê saet 9'an li navçeya Çelê ya Colemêrgê li artêşa TC a dagirker a li ser girê Xeregolê xistin. Çalakî ji du baskan ve li dijî stargeh û çeperên dijmin pêk hat. Di çalakiyê de 3 leşker hatin kuştin.
Roja 7'ê Mijdarê saet 12:30'î, hêzên me li dijî artêşa TC a dagirker ku li girê Şehîd Rahîme ya li navçeya Geverê ya Colemêrgê rêya ewlekariyê çêdikir, çalakiyek pêk anîn. Di çalakiyê de ji du baskan ve derb li makîneyên kar û çeperên leşkerên dijmin hatin xistin û kepçeyek hate îmhakirin. 6 leşkerên dijmin hatin kuştin."

## Divê DYA ji biryara xwe vegere

Meclisa Partiya Kesk a Kurdistanê ji DYA`yê xwest ku ji biryara xwe ya derbarê her sê şoreşgerên Kurd û rêveberên PKK`ê de vegere û ji ber sûcên li dijî gelê Kurd hesabê ji dewleta Tirk bixwaze.
Têkildarî biryara Wezareta Karên Derve ya Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê (DYA) ya derbarê 3 rêveberên PKK`ê Murad Karayilan, Cemîl Bayik û Duran Kalkan de Meclisa Partiya Kesk a Kurdistanê daxuyaniyeke nivîskî weşand.
Partiya Kesk ragihand ku DYA li şûna daxwaza agahiyan derbarê rêveberên Partiya Karkerên Kurdistanê (PKK) de, divê ji Tirkiyê bixwaze ku careke din vegere ser maseyê û bi PKK`ê re bide û bistîne.
Partiyê di berdewama daxuyaniya xwe de ji DYA`yê xwest ji biryara xwe vegere û ji dewleta Tirk derbarê sûcên li dijî gelê Kurd de kiriye, hesab bixwaze.
Partiya Kesk di dawiya daxuyaniyê de wiha got: "Heta ku hin dewlet parçeyên Kurdistanê dagir bikin û nehêlin gelê Kurd li welatekî demokratîk û azad bijî hebin, biryarên bi vî rengî nakevin xizmeta ewlehî û îstiqrara li Rojhilata Navîn."

## Bila DYE dev ji helwesta dij Kurd berde

Koordînasyona Kongreya Star bi daxuyaniyeke nivîskî biryara Amerîkayê ya derbarê 3 damezirînerên PKK'ê de şermezar kir.
Koordînasyona Kongreya Star derbarê biryara Wezareta Karên Derve ya Amerîkayê ya têkildarî 3 şoreşgerên Kurd û damezirînerên PKK`ê de daxuyaniyeke nivîskî weşand.
Di daxuyaniyê de biryar hate şermezarkirin û wiha hate gotin: "Berî her tiştî dost û dijmin jî dizanin ku dewleta Tirk xwediyê DAIŞ, El-Qaîde û bi giştî terorê ye. Gelê Kurd û derdorên aştîxwaz û demokrat ji aliyê dewleta Tirk ve rastî êrîş û komkujiyan tên. Dijminahiya dewleta Tirk li dijî gelê Kurd, gelên aştîxwaz û demokratîk tê zanîn. Ev di dagirkirin û kiryarên faşîstan ên li Efrînê de jî îspat bû."
Di daxuyaniyê behsa girîngiya rola her sê pêşengên tevgera azadiyê ji bo hebûna gelê Kurd hate kirin û wiha hat gotin: "Tevgera azadiya gelê Kurd ku bi pêşengiya Partiya Karkerên Kurdistanê (PKK) tê dikoşe, kedeke binirx ji bo azadiya mirovahiyê da û tu caran gelê Kurd wan bi tenê nahêle. Birêz Murad Karayilan, birêz Cemîl Bayik û birêz Duran Kalkan pêşengên gelê Kurd in. Tevgera azadiya gelê Kurd di berxwedan û rizgariya Kobanê û Şengalê de roleke gelekî girîng û dîrokî lîst. Bi hezaran mirov û bi taybet jî jin ji destê terora DAIŞ'ê rizgar kirin. Bi hezaran jin îro di nav wê tevgerê de ji bo mafê azadiya jinan tê dikoşin û li ber xwe didin."
Di dawiya daxuyaniyê de bang li Amerîkayê hate kirin ku tavilê dev ji helwesta xwe ya li dijî gelê Kurd û nirxên wî berde û vê biryara xwe careke din di ber çavan re derbas bike.



# "Keçên Rojê" li 180 sînemayan tê nîşandan

***Fîlma ''Keçên Rojê'' ya Derhênera Fransiz Eva Husson li 180 sînameyan tê nîşandan. Derhênera Fransiz Eva Husson diyar kir ku jinên Kurdan ti caran serê xwe netewandine, teslîm nebûne û li gel pergala zextkar û paşverû jî bi hêzeke derasayî û azaweriya têkoşînê li ber xwe dane. Husson got, "Min xwest bi vî filmî vê hêzê, vê azweriyê û berxwedanê nîşanî cîhanê bikim."***





Fîlma ''Keçên Rojê'' ya Derhênera Fransiz Eva Husson li 180 sînameyan tê nîşandan. Husson got fîlm tenê li Tirkiyê û Rûsyayê qedexe ye û got, "Heke ez biçim Tirkiyê, tenê ji bo ku min ev fîlm girtiye dizanim, dibe ku werim girtin."
Derhênera jin a Fransiz Eva Husson çîrokên jinên Êzîdî, ku li gel ji hêla DAÎŞ'ê ve hatin revandin jî dev ji berxwedanê û azweriya jiyanê bernedan û têkoşîiyan bi fîlma ''Keçên Rojê'' (Girs of the Sun) nîşanî cîhanê dike. Husson bi fîlmê ku li Cannesê jî hate nîşandan û gelekî hate ecibandin, niha jî li Fransayê li sînameyan tê nîşandan, dixwaze fîlm li Rojava şanî lehengên fîlm jî bike.
Husson di hevpeyvînê de ya bi rojnameya Yenî Ozgur Polîtîka re got revandina jinên Kurd a ji hêla DAÎŞ'ê ve, li gel vê jî teslîmnebûna wan, berxwedan û têkoşîna wan a dastanî pir karîgerî lê kiriye, diyar kir ku jinên Kurdan ti caran serê xwe netewandine, teslîm nebûne û li gel pergala zextkar û paşverû jî bi hêzeke derasayî û azaweriya têkoşînê li ber xwe dane. Husson got, "Min xwest bi vî filmî vê hêzê, vê azweriyê û berxwedanê nîşanî cîhanê bikim."
Bi rasthatina festîvala filman a Kurdan a 8´emîn li Hamburgê, derhênera filma Keçên Rojê, Eva Husson jî çû bajêr û di pêşandana filma xwe de jî amade bû ku di galaya festîvalê de hat nîşandan.
Derhênera Fransî dibêje di dema çêkirina filmê û girtina dîmenan de tişta herî zêde tesîr lê kirî hêza jinan û têkoşîna wan bûye. Naxasim jî hêza Zerê ya Êzîdî a ku li wargeheke penaberan serpêhatiya xwe digot: "Gava Zerê serpêhatiya revandina xwe û êşên xwe jî digotin, xurtiya wê, hêza wê diyar bû. Zerê jinek bû ku çeteyên DAIŞ´ê ew revandibû. Gava hewl dabû ji çeteyan bireve careke din hatibû girtin. Gava ku hewl dida bireve zaroka xwe wenda dike û piştî bi mehan hîna nû digihîje zaroka xwe. Di vê navê de ducanî dibe, li bazaran 14 caran tê firotin û Zerê behsa vê dikir."
Eva Husson dibêje, ew dixwaze filmê Keçên Rojê li Rojava jî nîşand bide. Bi Rojava re peywendiyên wê hene û şervanên jin jî dixwazin filmê bibînin, lê hîna bi temamî nediyar e ka film wê kengî li Rojava bê nîşandan.
Husson dibêje, di dema festîvala Cannesê de bavê wê beriya nîşandana filma wê bi 3 rojan wefat kiriye û ji ber vê ew gelekî xemgîn bûye û wiha behsa atmosfera piştî nîşandana filmê dike: "Gelek mirovan û nexasim jî jinên ciwan ez hembêz dikirim û pîroz dikirim. Lewma van mirovan Êzîdî û Kurd tenê ji çapemeniyê û televizyonê nas dikirin. Lê bi piştî vê filmê, ez bawer dikim di navbera jinên Kurd û jinên li vir peywendiyeke hestî dikare çêbe. Her kesî digot, mala te ava ji ber ku te hêza jinan nîşanî me da."

### LI 180 HOLÊN FRANSA TÊ NÎŞANDAN

Eva Husson da zanîn ku filma wê li Kanada, Swîsre, Ingilîstan, Korsîka û Taywanê beşdarî festîvalan bibe. Film niha li Fransayê li 180 holan tê nîşandan, li Swêdê û li tevahiya welatên rojhilata Navîn jî wê bê nîşandan ji bilî îstîsnayekê û ew jî Tirkiye ye: "Balkêş e, tevî ku film wê li tevahiya dinayayê bên nîşandan, bi tenê li Tirkiye û Rûsyayê qedexekirî ye. Heta, ez pê dizanim, heger ez biçim Tirkiyê, ji ber ku min ev film çêkir ez ê bêm girtin."

## Huner lêgerîna heqîqetê' ye



Di çarçoveya rêzeçalakiyên ji bo daxwaza azadiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan çalakiyên çandî hatin lidarxistin.
Bi diruşmeya 'Huner lêgerîna heqîqetê ye' ku gotina Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalane Tevgera Çand û Hunerê ya navçeya Çilaxa ya herêma Cizîrê di çarçoveya rêzeçalakiyên şermezarkirina tecrîda li dijî Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û bi daxwaza azadiya wî li Navenda Çand û Hunerê çalakiyeke hunerî li dar xist. Bi sedan şêniyên navçeya Çilaxa beşdarî çalakiyê bûn.
Rêvebera Navenda Çand û Hunerê ya Çilaxa Rojîn Îsmaîl axivî û bal kişand ser rola çand û hunerê di runêsansa gelan de.
Hevserokê Meclisa herêma Dêrikê Mihemed Abdulrehman jî axivî û ev tişt anî ziman: "Asta pêşketina çanda her civakekê bi qebûlkirina çandên gelên din tê pîvandin, lewra siyaseta me hevgirtina hemû gelên li ser xaka Rojava Kurd, Ereb û Suryan esas digire. Hezkirina me ji çandê re tê wateya girêdana me bi axa xwe ve, di heman demê de dûrketina me jî çandê tê wateya dûrketina me ji ax û azadiya xwe."
Rêveberê Buroya Desteya Çand û Huner ya Girkê Legê Xelîl Tehlo jî axivî û girîngiya pêşxistina çandê destnîşan kir û wiha got: "Bi salan me têkoşîna parastina çandê kir. Tinekirina çanda gelekî tê wateya tinekirina wî gelî. Bi saya xwîna şehîdan em gihiştinê vê astê û şoreşa me şoreşa fikrî, çandî û exlaqî ye."
Piştî axaftinan, Koma Serhildan a girêdayî navenda Aram Tîgran stran gotin, Koma Çarçêla şanoyek bi navê "Efrîn keleha berxwedanê ye" pêşkêş kir û helbest hatin xwendin…*ANHA*

## Yekemîn Kovara Muzîka Kurdî: Ziryab



Yekem kovara muzîkê ya xwerû bi kurdî, tevahiya wê rengîn û li ser kaxeza kûşe Ziryabê dest bi weşanê kir.
Kovarek din jî li weşangeriya kurdî zêde bû û di nav refên weşanxen û pirtûkfiroşan de cihê xwe girt. Ev Kovara Ziryab e.
Yekem kovara muzîkê ya xwerû bi kurdî, tevahiya wê rengîn û li ser kaxeza kûşe Ziryabê dest bi weşanê kir û hejmara yekemîn derket. Kovar wê ji 4 mehan carek derkeve.
Desteya weşanê ya Ziryabê ji van kesan pêk tê: Ji Siya Şevê Gokçe Selîm û Serhed Temel, Harûn Elkî û Ozan Irmak. Edîtoriya kovarê jî Mewlûd Oguz û Serhed Temel dikin.
Desteya weşanê armanca derxistina kovarê wiha vedibêje: "Em dixwazin pirsgirêkên muzîka kurdî û pirsgirêkên muzîkjenên kurd li her deverê û li her qonaxê bi zimanekî erênî, nêrînên berfireh û heta derfet hebe bi her zaravayên kurdî bên nîqaş kirin. Armanca me muzîka ku bi keda salan û bi nirxên bilind hatiye afirandin, bi çavekî zelal û guhekî vekirî berpêşî xwînerên kurdî bikin. Hêviya me ew e ku ji muzîkjen û dilsozên muzîkê re qadeke nû ya xweîfadekirinê vekin. Û em dixwazin hinek be jî siya li ser muzîka kurdî rakin."

### NAVEROKA HEJMARA YEKEM

Naveroka yekemîn a Ziryabê wiha ye: "Harûn Elkî ji salên 90'î û heta niha panoramayek berpêş kiriye û derbarê bandora medyaya civakî ya li ser muzîkê bi nivîseke têr û tije hejmara yekemîn xemilandiye. Îbrahîm Sarisu li ser Orfeus ê ku di dîroka muzîkê de di nav çend hozanên herî ewil de ye û derbarê mozaîka wî de bi mijareke balkêş cih girtiye. Serhat Temel derbarê serpêhatiya têkçûna Orkestraya Heskîfê de bi nivîseke taybet me ji rewşa atmosfera salên dawiyê dide serwext kirin. Serdar Ozturk porteyeke dengbêjê nemir Reso nivîsandiye.
Di hejmara yekemîn de bi hunermend Kerem Gerdenzerî , Ayfer Duzdaş, Mem Ararat, Ednan Kartal, Cem Şivan Ergul, Siya Şevê û Rewşan Çelîker re hevpeyvîn hatiye kirin.
Di kovarê de ji bilî gotar û hevpeyvînan danasîna albûma Mirady û nirxandinek li ser albûma Serhed Ertunayî jî heye. Her wiha di kovarê de nûçe, danasîna kitêbeke muzîkê û playlîstek jî heye.
Hêjayî gotinê ye ku di hejmara yekemîn de postera mezinê rocka bi kurdî Kerem Gerdenzerî û albûma Siya Şevê ya bi navê "Li Pey Siya Xwe" weke diyarî tê dayîn.

## Hezkirin



Sîpan ŞÎNDA

Hezkirin, ango sedemê jiyanê, bingehê hebûna xwezayê, yê mirovatiyê. Tişta kû giyanê dide jiyanê ye hezkirin. Serkaniya evînê ye. Wateya hebûna zindiyane hezkirin. Hezkirin ji xwezayê tê. Ji ber wê rayên wê gelik kûr û stûre. Hezkirin ji nava dil tê, ji ber wê heya dil dijî ango ter be hezkirin ji heye. Hezkirin ji nava dilê dayîkan, yê bavan tê ji ber wê bê sînore. Hezkirin ji nava dilê evîndaran tê ji ber wê gelik nazike.

Gelo çima mirov hij tiştan dike? Hijêkirin ji kû tê? Hezkirina tiştekî, xwestina tiştekî tê çi watê? Çawe mirov di nava jiyanê de nikare bê nefes bijî, mirov nikare bê hezkirin ji bijî. Dema di nava dilê yekî/ê de hezkirin tefisî, ew ji dimire. Mirina hezkirinê ya di dilê mirovî xirabtire ji mirina giyanê mirovî. Hezkirin, çira, roniya dilê miroviye. Çawe dema serkanî diçikê hişînahiya li ber wê ji hemî hişk dibe, dema hezkirin jî ji nava dilê mirovî de diqede, dil û giyanê mirovî ji hişk dibe. Hezkirin gelik wateya di nava xwe de dihewîne. Hezkirina xwîşk û bira, ya zarokan şewqete, hezkirina xwezayê, ya ger û geştê, ya jiyanê zewqe, hezkirina destgirtiyan sermestiye… Mirov heyran dimîne ji gelik tiştan re. Weke dema mirov diçe li ser Çiyayê Nemrûd tirîjên rojê derdikeve û mirov seyrê dike. Mirovî şad û sermest dike. Yan ji dema roj diçe ava, dema mirov diçe li ber sîlaveka bilind tê xwar disekine, mirov her mirêkare lê binêre.

Hezkirina kû felsefe qal dike, hezkirina giştiye. Ne li gor kesan, li gor ideolojiyane. Hezkirinek ji bo hemi kesan û hemi tiştî ye! Tişta kû di bingehê hebûna xwezayê de ye. Dostanî, girêdana evîndariyê, cangorîtî ji hezkirinê tê. Em ji hezkirinê çêbûne. Hezkirina dê û bavan ji xweza wan tê. Hezkirina evîndaran ji gelik caran kore. Ji ber wê dema yek evîndarê yekê dibe û evîndariya wan bê bersiv dimîne, dikarin evîna xwe bikujin. Çawe mirov dikare ya/yê kû mirov hijê dike bikuje? Ji ber wê kore, mirovî çavsor dike. Ev hezkirina qelse. Ne ya resene. Di hezkirinê de berjewendî nîne. Eva henê hezkirineka Fruîdî ye! Yê/ya kû vê dike esas armanca wana ya rastî, dixwazin ji wana bê hezkirin. Ji ber kû ew ne kesên azadin. Dixwazin hineke din ji bêxin di nava zindana xwe de. Lê di hezkirina rastî de azadî heye. Tişta kû azad be, mirov çawe dikare wê vehewîne di nava koletiyê? Dera koletî lê hebe kîn û nefret ji lê heye. Lê di hezkirinê de kîn û nefret nîne. Hezkirinê deriyê xwe ji koletiyê re, ji kîn û nefretê re girtiye. Dera kîn û nefret lê hebe, her tim hesûdî, şer û neyartî heye.

Mirovên ji hezkirina rastî dûrdikevin, dojeha xwe bi xwe ji xwe re çêdikin. Gelo çi tişt mirovî ji hezkirinê dûr dixe? Yan ji çima mirov ji hezkirinê dûrdikevin? Ne azadî, ango berjewendiyên takekesî. Mirov çima ji mirinê nefret dikin? Na, ne ji hezkirina jiyanê ye, ji jiyîna jiyaneka ne azade. Dema mirov ne azad bijî, tirsa di dilê wan de ewe kû, ew koletî piştî mirinê ji dewam bike. Hezkirin vedigire. Kesê azad be dikare hezkirina rastî di nava dilê xwe de bihewîne. Hezkirina pijayî, ango bê nexweşî, mirovî geş dike, kesan ji dil bi hevve girê dide. Mirovî ji xofan, ji berûxwetiyê dûr dixe. Hezkirina rastî kurmê koletiyê, rayê kîn û nefretê, tirsa mirinê di dilê mirovî de dikuje.

# Avakirina Kampa Ziyaretê bi dawî dibe

**Ji ber êrîşên dagirkeriyê yên li ser Efrînê bi deh hezaran welatiyên Efrînê neçar man ji Efrînê derkevin û li Şehbayê bi cih bibin. Heta niha gelek kamp ji bo Efrîniyan hatine ava kirin. Şaredariya Gel a Şêrawa bi hevkariya Desteya Rêveberiyên Herêmî û Şaredariyan li gundê Ziyaretê kampeke din ava dikin. Tê payîn ku kamp di nava du hefteyan de bi dawî bibe.**

Şaredariya Gel a Şêrawa bi hevkariya Desteya Rêveberiyên Herêmî û Şaredariyan bê navber ji bo avakirina kampeke nû li gundê Ziyaretê dixebite. Li gorî rêveberiya kampê piştî 15 rojan wê welatiyan pêşwazî bikin.

Ji ber dagirkirina Efrînê bi deh hezaran Efrînê li herêmên Şehbayê bi cih bûne. Şaredariya Gel a navçeya Şêrawayê bi hevkariya Desteya Rêveberiyên Herêmî û Şaredariyan a Efrînê ji bo welatiyên Efrînê kampeke nû li gundê Ziyaretê ava dike.



Şaredariyê heta niha cihê 40 konan bi dawî kiriye. Her wiha xebat hê jî berdewam dikin. Li gorî rêveberiya kampê tê payîn ku di 15 rojan de kamp amade bibe.

Têkildarî mijarê hevserokê Şaredariya Gel Mihemed Elo axivî û wiha got: "Em ji bo amadekirina kampê dixebitin. Me gelek pêngav bi dawî kirine. Niha em di pêngava dawîn de ne û wê di 15 rojan de kamp welatiyan pêşwazî bike."

Ev kamp, kampa pêncemîn e ku ji bo welatiyên Efrînê li navçeya Şêrawa tê avakirin…*ANHA*

## Jiyan li Reqa'yê roj bi roj geş dibe



Piştî rizgarkirina bajarê Reqayê jiyan roj bi roj li bajêr geş û zindî dibe.


Salek li ser rizgarkirina Reqayê re derbas bû. Jiyana civakî li bajêr roj bi roj pêş dikeve û aramî li bajêr rûdinê. Gelek dikan û navendên tenduristiyê ji nû hatin vekirin.

Niha bajar gelekî geş bûye û tevgera welatiyan li kolanan zêde buye. QSD'ê ve di 17'ê Cotmeha sala 2017'an de, Reqa ji çeteyên DAIŞ'ê rizgar kir. Di encama dagirkerî û wêrankariya DAIŞ'ê de sûkên bajêr, dikan, nexweşxane û firin gelekî wêran bûn.

Sûkên bajarê Reqayê ji nû ve geş bûne. Dikan hatine vekirin û bi taybet li kolanên Girê Spî, El-Mensûr, El-Wadî, 32'yê Sibatê û El-Amasî. Welatî ji bo peydakirina pêdiviyên xwe diherikin sûkan. Heta niha derdora 5 hezar û 500 dikan hatine vekirin.

Têkildarî mijarê xwediyê dikaneke şîraniyan li kolana Girê Spî bi navê Ebû Ehmed wiha got: "Dikana min mîna gelek dikanan wêran bû. Lê niha ez ji nû ve dixebitim. Tevî gelek astengiyan lê dikan mîna berê tên vekirin."…*ANHA*

## Li Şêxmeqsûdê sûka gelêrî vebû



Şaredariya Helebê bazareke gelerî li taxa Şêxmeqsûd vekir.

Şaredariya Gel a Helebê bi armanca peydekirina cihekî ji bo firotinê û birêxistinkirina tevgera çûn û hatinê bazareke gelerî ji firoşkarên taxa Şêxmeqsûd re vekir.

Bazar li beşê rojhilatê taxê hate vekirin. Rûpîvana bazarê 900 m2 ye û wê têde hemû pêdivî ji (Şênkahî, cil, alavên xwarin û vexwarin hwd) bêne firotin.

Bi dehan şêniyên taxê beşdarî vekirina bazarê bûn.

Di vekirina bazarê de Hevseroka Şaredariya Gel a Helebê Valentîna Ebdo axivî û vekirina bazarê li



welatiyan pîroz kir.

Valentîna destnîşan kir ku ev bazar ji bo firoşkaran jêdereke aborî ye. Endamê TEV-DEM'ê yê Helebê Mehdî Bîlal jî axivî û anî ziman ku jiyan li taxa Şêxmeqsûdê vedigere û pêwîstiyên şêniyan zêde dibe.

Ev bazar bi armanca rêxistinkirina tevgera çûnûhatinê û peydakirina pêwistiyên welatiyan hate vekirin…*ANHA*

## Akadimiya Bês Nehrîn li Hesekê

**Ferîşte NEZÎR**

Bi saya şoreşa Rojava û Bakurê Sûriyê gelek akadimiyên perwerdehî û zanistî vebûn, ku ev akadimî di pêşxistina asta hişmendiya û pêşveçûna civakê û taybet jinê ku xwe û mafê naskirin de xwedî rolek girînge. Yek ji van akadimiyan, Akdimiya Bês Nehrên a Suryanî li Kantona Hesekê bi armanca ku rol û misyona ciwana Sûriyan bi hêz û xurtir bike hate vekirin.

Têkîldarê mijarê Rêveberiya Akadimiyê Sîham Qiryo derbarê armanc û xebatên akadimiyê ev tişt bi rojnemaya Ronahî re berve kir. Û diye kir ku Şoreşa Rojava û Bakurê Sûriyê bi tabetmendiya guhertina û veguhertina siyasî, civakî, aborî û çandî hatiye teyisandin. Ku jin bi tevahî rola xwe di avakirina civakel exlaq û polîtîk de lîst."

### SEDEMÊ VEKİRİNA AKADİMİYÊ

Rêveberiya Akadimiyê Sûriyanî Sîham Qiryo anî ziman ku di encama şerê ku li Rojava û Bakurê Sûriyê di qewimê, jin rastî gelek zextên derûnî, bedenî û civakî hate, da ku em van zextan sivik bikin û bibin bersiv, bi însiyatîfa Yekîtiya Jinên Sûriya akadimiya Bês Nehrîn a Sûruaynî vekirin. Ku Akadimî di 11'ê Cotmehê li Kantona Hesekê ji hêla jinên ciwan ku peceyek sereke ji Yekîtiya Suryanin hate vekirin. Bi vê wesîleyê keçên Suryan jî beşdarî xebat dibin û qabilyetên xweyî hunerî û zanistî bi hêzdikin, her wiha ji bo pêşxistina kesayet û hişmendî semînerên fikrî, siyasî, dîrokî û aborî hatin dayîn. Ku di encama yekemîn dewreya de ser heftiyekê 25 jin perwerde bi dawî kirin, her wiha tê payîn ku di demên pêşde dê ku dewreyên girtî jî bên destpêkirin."

### AKADİMİYA MESLEKÎ Û RAMYARÎ YE

Sîham destnîşan kir ku di akadimiyê de beşên cûda wekî Dirûtin, kûwafor, zimanê Ferensî û Engilîzî û kombiyuter hatine vekirin û wiha dom kir: "Ku piştî van perwerdehiyan bawernameya Akadimiyê werdigrin da ku ser bingeha vê bawernameya xwebat bikin. Her wiha di pêşxistin û xizmeta civaka xwe de xwedî rol be û hebûna xwe bi karê xwe dide nîşan. Di akadimiyê de perwerdeyên teyorî û semînerên ramiyarî, siyasî û çandî jî têne dayîn, dê mîna van perwerdeyan bingeha gav avêtina ber bi raman û jiyanek azad û demokrasî ye. JI ber ku bi semîneran de gele mijarên wekî (Doza azadiya jin û dîroka wê, naskirina dîroka gelê Suryanî û dîroka têkoşîn û berxwedaniya gelê wê ku ji sala 1988'an de destpêkir, her wiha semînerên ser Netewa Dîmokratîk û Rêveberiya Xwesr jî tê dayîn."

### GİRÎNGİYA PERWERDÊ Jİ BO WAN

Sîham bal kişand ser girîngiya perwerdehiyê û wiha got: "Mîna van perwerdeyan hevaltî û zanistê zêde dike, her wiha jinên Suriyan di lêhurbûn û lêkolînan de kûr dibin û wiha rola xwe di milê aborî, civakî û siyasî de pêşdixin. Jinên Suriyan dikarin bi hêz û baweriya xwe asta civakê di milê fikrî û



zanistî de pêşbixe, di heman demê de jî pirsgirêkên jin û civakê di riya gotubêj ku di hola semînerê de têne kirin; bi kurahî têne nîqaşkirin. Di encama van nîqaş û pêşniyaran de dighêjin çareseriyek guncaw ku jin karibe bermaberî wan pirsgirêkan çareseriyekê avabike."

### TEKOŞÎNA ME Jİ BO AZADİYA JİNÊN YE

Rêveberiya Akadimiyê Sîham Qiryê da zinşn ku tevî ku akadimî nû vebûye jî lê tevlî bûn jinna heya astekê başe, her wiha ya girîniya vê akadimiyê ku ev yekemîn akadimiya xweser a jinên Suryan li Hesekê hatiye vekirin. Û di dawî de Sîham Tekezkir ku bila jina Suryan bizani be ku tekoşîna me di pêla yekemîn de ji bo azadî û xweseriya wê ye."

## Çare



### Belgekirin

Sîpan CAN

Belge an arşîv ji bo her karekî girîng e. Di serî de belgekirina dîrok û wêje heya ber bi arşîvkirina buyerên rojane ku mirov tê re derbas dibe yên nav lê tê kirin (bîranîn) lê di navber wan hersê gotinan( belgekirin, arşîv û her wiha bîranîn) de heya astekê şibandin heye û her wiha hinek ferq û cûdatî jî heye. Dibe ku her tiştê ji van bibe delîlekî ku dema bê xwestin bandora xwe li ser dozekî, an jî çareserkirina pirsgirêkekî bike. lewra ev mijarekî girîng e. dibe ku kaxizek mûhirkirî jî têra xwe bibe delîl û di derbarê mijara ku tê lêkolînkirin bibe amûrê herî xort ya serkeftina dozê.

Bi hezarên salan li ser serê kurdan keraset, êrîş û komkujî pêk tên; lê bi qasî ku bi devokî ji kal û dapîran hatine bihîstin tu carî bi delîlên zindî ne hatine pêşkêş kirin. Ango, kesî tu carî ne fikirî ye ku belge bike, hebe jî gelek kême û veşartî ye. ger belge bike jî ne li gorî şert û mercên an jî qûralên wê yên heyî ye. Ya din jî, ger buyerek hatibe belgekirin aliyên peywendîdar nikarin sûdê jê bigirin û bikaribin bixin rojeva cîhanê. Mînaka Efrînê ber çavê her kesî ye. her çiqasî xebatên belgekirrinê hatin kirin; lê heya niha em dikarin bêjin ne ketiye rojeva saziyên peywendîdar yên bikaribin van meseleyan çareserbikin û zextê bikin.

Ji bo ku buyerek bê belgekirin şert û mercin hene divê bên peyda kirin, bêyî wan pirsgirêk nikare di rojeva cihên peywendîdar de bê derbaskirin. Ango hin faktor divên ew jî evin: komkirina belgeyan bi dateyên herî zirav, her wiha tekezkirina agahiyan, û ya herî girîng e, ev belge biçin ber destê kê û çawa bikaribe bandorek xwe bike. ya herî girîng jî belgeyên zindî hebin, divê ne her tişt devokî. Mîna wêjeya kurdî, her çiqasî bi riya devokên bav û kalan hatibin gotin; lê di warê nivîsê de ji bo ku bibe mala dîrokê gelek lawazî hene.

Pirsgirêka kurdan hertim ew e ku nikarin xwe derbirînin. Derbirandin li ba kurdan gelek qels e lewma li cîhanê nikarin xwe baş bidin nasîn û derdên xwe vebêjin. Nexasim di demên şer de, ku bi hezarên sivîl di nav komkujiyan re derbas dibin.

Pêwîste ji bo vê mijarê, aliyên peywendîdar komîte an jî ekîpekî pispor taybet bi belgekirina van mijaran ava bikin ku bikaribe bibe bingeha amedekirina dosyayên berfireh di derbarê binpêkirinên mafê mirovan li Bakur û Rojhilatî Sûriyê, taybet binpêkirinên ku rojane ji aliyê dewleta tirk ve pêk tên, ku ya herî zêde divê xebat li ser bê kirin ew e û bibe aramanca serke ya rêvberiyê ku bikaribe ji bo delweta tirk sînorekî daynin û di dadgehên navnetewî de li ser sûcên şer yên i Efrînê kirine bê darizanin.



# Divê jin zêdetir xwe bi rêxistin bikin

**Hevseroka Meclisa Rêveber a TEV-DEM'ê Zelal Ceger li Kampa Serdem a Şehbayê tevlî civîneke ku bi dehan jin lê amade bûn, bû û rewşa siyasî ya herêmê û Sûriyê nirxand. Zelal diyar kir ku hêzên derve hê zêdetir aloziya Sûriyê kûr dikin û da zanîn ku divê jin xwe ji bo berxwedan û têkoşînê amade bikin û xwe hê zêde birêxistin bikin.**

Hevseroka Meclisa Rêveber a TEV-DEM'ê Zelal Ceger diyar kir ku şerên li herêmê rû didin, şerên kapîtalîzmê ne û bang li jinan kir li dijî van şeran xwe bêtir birêxistin bikin.

Bi armanca nirxandina pêşveçûnên dawî û rola jinan di rêxistinkirina civakê de, Hevseroka Meclisa Rêveber a Tevgera Civaka Demokratîk (TEV-DEM) Zelal Ceger civînek ji jinên Kampa Berxwedan re li dar xist. Bi dehan jin tev li civînê bûn.

Zelal Cîger di civînê de behsa pêveçûnên siyasî yên li Sûriyê şerê tinekirina DAIŞ'ê kir. Zelal Ceger anî ziman ku bi dawîbûna DAIŞ'ê wê herêm derbasî qonaxeke nû bibe.

Zelal destnîşan kir ku hêzên herêmî û cîhanî yên ku mudexeleya karûbarên Sûriyê kirin aloziya Sûriyê çareser nakin, lê belê ji bo



berjewendiyên xwe tevdigerin. Zelal destnîşan kir ku hemû şerên li herêmê rû didin şerên kapîtalîzmê ne. Ev hêzanan şerê fikra Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan dikin. Zelal diyar kir ku Rûsya û Amerîkayê tevî nakokî û dijminahiyên xwe, lê nûnertiya heman pergalî dikin. Her du hêz jî gelê herêmê ji bo bidestxistina berjewendiyên aborî bi kar tînin.

Zelal wiha dewamkir: "Di nav vê rewşê de divê welatî li ser bingeha Şerê Gel yê Şoreşgerî xwe birêxistin bikin. Ji ber ku siyasetên şerê taybet destpêkê civakê dike hedef. Ji lewre eger gel azadiya xwe dixwaze divê xwe hertim ji têkoşînê re û bi hemû şêwazan amade bike."

Hevseroka Meclîsa Rêveber a TEV-DEM'ê Zelal Ceger di dawiya axaftina xwe de wiha got: "Di Berxwedana Serdemê de asta hêz û vîna jina Efrînê hat dîtin. Niha jî berxwedana xwe li Şehbayê didomîne, ji ber ku xwe baş bi rêxistin kiriye. Şoreşa Rojava bi Şoreşa Jinê hate naskirin, ji lew re divê îro hemû jin di nav van şert û mercan de ji bo berxwedan û têkoşînê amade bin."…*ANHA*

## Tirkiye êrîşî destkeftiyên gelan dike



Seroka Partiya Pêşerojê ya Sûriyê a Minbicê Fetûm Şeriq derbarê êrîşên dewleta tirk ên li ser Bakurê Sûriyê diyar kir ku Tirkiye bi piştgiriya hêzên navneteweyî êrîşî gelên Bakurê Sûriyê dike û got: "Tirkiye ne li dijî terorê li dijî destkeftiyên gelan şer dike û piştgiriyê dide çeteyan."

Êrîşên dewleta tirk ên li ser Bakurê Sûriyê didome. Têkildarî mijarê Seroka Partiya Pêşerojê ya Sûriyê yê şaxê Minbicê Fetûma Şeriq da zanîn ku yê hêzê dide terorê Tirkiye ye û wiha got: "Erdogan nahêle gelên li Sûriyê bi aramî bijîn. Ew piştgiriyê dide terorê. Terora wekî DAÎŞ û OSO hêza xwe ji pergala dewleta tirk a ne demokratîk digire.

### DEWLETA TIRK NAXWAZE DAIŞ TUNE BIBE

Fetûma diyar kir ku gelê Kurd her dem li dijî terorê li berxwe daye û ji bo mirovahiyê şer kiriye û wiha got: "Dewleta tirk a dagirker naxwaze teror xelas bibe. Tenê ji bo berjewendiyên xwe li ser esasên nîjadperestiyê gelê Kurd û nirxên mirovatiyê hedef digire. Lê Erdogan tena serê xwe vê yekê nake. Bi hevkariya Rûsya, Amerîka û hêzên wekî din vê yekê dike. Hêzên navneteweyî jî ji bo berjewendiyên xwe Tirkiyê bi kar tîne. Tirkiye niha di nava aloziyek mezin de ye."

Seroka Partiya Pêşerojê ya Sûriyê ya Minbicê Fetûm Şeriq di dawiya axaftina xwe de wiha got: "Dewleta tirk tu carî nexwestiye ku Kurd bibin xwedî statu. Lewra her dem piştigrî daye terorê ku gelê Kurd tune bike. Bi vê yekê girêdayî destkeftiyên hemû gelan hedef hatiye girtin. Tirkiye ne li dijî terorê li dijî destkeftiyên gelan şer dike û piştgiriyê dide çeteyan. Erdogan nahêle gelên li Sûriyê bi aramî bijîn. Ew piştgiriyê dide terorê. Terora wekî DAÎŞ û OSO hêza xwe ji pergala dewleta tirk a ne demokratîk digire. Ji bo gelê Kurd xwe biparêze hêz, îrade û têkoşînek hevpar divê. Bila hemû kes bizanibe ku ji bo çareseriya pirsgirêkan divê gelê Kurd muxatab bê girtin û pêwîste hemû cîhan li dijî êrîşên dewleta tirk derkevin."…*JINNEWS*

## Li Şêxmeqsûdê jin aboriyê pêş dixin

Kongreya Star a Helebê bi projeyên biçûk hewl dide aboriya jinan bi pêş bixe û piştgriya keda wan bike. Niha jî hewl dide plan û projeyên nû ji bo pêşerojê pêk bîne.

Piştî lidarxistina konferansa duyemîn di meha Hezîranê de û rêzebiryarên rêxistinî, civakî û aborî û bi armanca pêkanîna qezencê û piştgiriya jinan di warê aborî de, Kongreya Star projeyên nû li taxa Şêxmeqsûdê vekirin.

Rêzek ji projeyên aborî ku kongreyê pêşkêş kirine, bi rêya peydakirina karker û kesên xwedî tecrube, madeyên destpêkê û hêsankirina teşwîqkirinê li sûkan bi cih anî. Ji van projeyan kargeha çêkirina madeyên paqijiyê bi navê Kulîlka Çiya hate vekirin. Li kargehê 3 karkerên jin dixebitin.



Têkildarî mijarê karkera bi navê Nêrmîn Zênel diyar kir ku kargeh beriya çend hefteyan hatiye vekirin û xwestekên dikanan yên madeyên paqijiyê bi cih tîne.

Komîteya Aborî dikana şêraniyê ku tê de 8 karker dixebtin, vekir. Di dikanê de gelek cureyên şêraniyên navdar yên Sûriyê tên çêkirin.

Girêdayî mijarê karkera bi navê Orîvan Mihemed ku li dikana şîraniyê dixebite, wiha axivî: "Ev kar, hişt ku ez xwe bi pêş bixim. Ez bi hêvî me ku Kongreya Star projeyên bi vî rengî berfireh bike, da ku tax vegere mîna beriya şer."

Têkildarî mijarê endama rêveber a Kongreya Star Nehla Mistefa wiha got: "Piştî lidarketina konferansê, gelek biryar hatin girtin û plansaziyek aborî ku rola jinan xurt dike hate derxistin. Ji ber ku jin bingeha civakê ye. Armanc jê, ji nû ve vejandina aboriya taxê ye."

Nehla wiha got: "Jinên taxa Şêxmeqsûdê ji aliyê aborî ve û di encama şerên ku rû dane de zehmetî kişandine. Îro gelek proje ji bo bilindkirin û pêşxistina aboriya jinan hatine pêşkêşkirin."

Ji bo temamkirina plansaziya ku hatiye danîn, Komîteya Aborî ji bo vekirina du şaxên din ji bo firotina alavên paqijiyê dixebite. Her wiha xebatên vekirina xwaringeha xwarinên gelêrî yên kurdî û dikanek ji bo firotina rîs û çêkirina cilên rîs were vekirin…*ANHA*



## Tirsa Mirinê

Binevş SARYA

Rastiyeke wiha ya zilmê û destihiladariya dewlet-neteweyan heye. Dema tengav dibin û ber bi tinebunê ve diçin, weke gurê har êrîşî her kesî û her tiştî dikin. Ya rast, eger mirov van destihiladaran bişibîne guran jî wê neheqiyeke gelek mezin be. Lewre candarên di xwezayê de tev li gorî pêwîstiyên xwe nêçîrê dikin. Jixwe rastiyeke wiha ya jiyanê heye; her tişt li gorî pêwîstiyan tevdigere. Lê zilimkarên ku dewlet-neteweyan bi rê ve dibin, ti caran li gorî pêwîstiyan li jiyanê nanêrin. Jixwe li gel wan girîngiya jiyana kesan yan jî civakan nîne. Li gorî wan cîhan û roj li dora wan dizivirin. Ji wan weye qey wan gerdûn afirandiye û her tişt ji bo wan hatiye afirandin. Lê bawer dikim ji bîr dikin ku dawiya her kesî çûna binê axa sar e. Jiyan ji bo tu kesî ne bêdawî ye û ti kes jî ne bêmirin e. Eger jiyaneke bêmirin hebûya wê Gilgamêş ewqas li pey jiyaneke bêdawî neketibûya, yan jî wê Îskenderê Mekdonî rêwîtiya bêdawî ya cîhanê nekiribûya. Lê belê wisa xuya ye ku di roja me ya îro de serokdewletên niha ji bîr dikin ku wê rojekê ew jî bimirin û hebûna wan nemîne.

Gotineke pêşiyan e; dibêjin dema tu hatî dinê her kes keniya û tu digiriyayî. Wisa bijî ku dema tu ji dinê ber bi koça dawî ve çûyî, bila her kes bigirî. Destihilatdar wisa dijîn ku rojê bi hezaran dayîk nifiran li wan dikin û li benda mirina wan in. Di binê destihilatdariya dewlet-neteweyên niha de kesê êşa windayiya kezebê nekişandî nemaye. Li welatê me he roj bi dehan zarok tên kuştin û windakirin. Zarokên hê nebûyîn 13 salî, bi 13 guleyan tên kuştin. Zarokên 6 salî dibin hedefa segivanekî û dawî li jiyana wan tê anîn. Gelo ma wê ev gerdûn van destihiltadaran efû bike? Ne gerdûn û ne jî edaleta dilê dayîkan, wê van zaliman efû bike. Li welatekî ku he roj zarok bi tirsa mirinê şiyar dibin tu nikarî behsa wekihevî û edaleta wî welatî bikî. Bi salan e ku gelê vî welatî tûkoşînê dike da bikare bi awayekî azad û bê tirsa mirinê paşrojekê ji zarokên xwe re ava bike.

Rastiyeke bedewiyê ya wiha heye, ku bedewî dibe bela serê mirovan. Lê bedewiya welatê me nebûye bela serê me, li welatê me bedwî jiyanê dide avakirin. Di heman demê de ev bedewî dibe tirs û dikeve nava dilê zordestan. Ya rast hebûna me ji bo wan tirsa herî mezin e. Ew ne ji şoreşgerên vî welatî tenê ditirsin, ji zarok, ciwan, kal, pîr û heta ji hestiyên miriyên me jî ditirsin. Ji tirsa windakirina destihiladariya xwe, li her kesî û her tişta ku wateyê dide jiyanê dinin û welatan talan dikin. Piştî talana Efrînê niha jî dagîrkeran berê xwe daye herêma Firat û Cizîrê. Yek xeyalê dagîrker Erdoxan heye; ew jî tinekirina gelê Kurd e. Lê ji bîr dike ku ev gel zarokên çiya ne. Eger îro em mirov û zindiyên din dijîn, bi saya hebûna çiyayan e. Kurdên ji Cûdî û Zagrosan çêbûyîn wê ti hêz nikaribe dawî li koka wan bîne, heta wê vê di xwenên şevan de jî nebînin. Her demê gel bi ser ketine û wê di sedsala 21. de jî dîsa gel bi ser bikevin.

# Bi tecrîdkirina Ocalan civakê tecrîd dikin

**Tecrîda girankirî ya li ser Rêber Ocalan dewam dike. Parlamenterê HDP'ê Omer Ocalan diyar kir ku bi tecrîdkirina Rêber Ocalan civak tê tecrîd kirin û da zanîn ku tenê Ocalan dikare rê li ber şerê Rojhilata Navîn bigire. Omer Ocalan got; "Ji bo bidawîkirina tecrîdê çi ji destê kê tê divê bike."**




Parlamenterê HDP'ê Omer Ocalan diyar kir ku tenê Ocalan dikare rê li ber şerê Rojhilata Navîn bigire û got: "Bi tecrîdkirina Birêz Ocalan re hemû civakê tecrîd dikin. Ji bo bidawîkirina vê rewşê jî çi ji destê kê tê divê bike."
Tecrîda giran a li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan 20 sal in dewam dike û tecrîd roj bi roj girantir dibe. Parlamenterê Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) yê Rihayê Omer Ocalan diyar kir ku tenê du hevokên ji Îmraliyê dikare Tirkiyê rehet bike.

**TIRKIYE BER BI KARESATEKÊ VE DIÇE**

Ocalan da zanîn ku 20 sal in tecrîd li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan dewam dike û anî ziman ku di nava sê salên dawî de tecrîd her ku diçe giran dibe. Ocalan destnîşan kir ku tu agahiyên malbat û heyetê ji rewş û tendirustiya Birêz Ocalan nîne û wiha axivî: " Tenê Ocalan dikare rê li ber şerê Rojhilata Navîn bigire. Bi tecrîdkirina birêz Ocalan re hemû civakê tecrîd dikin. Ji bo bidawîkirina vê rewşê jî çi ji destê kê çi tê divê bike. Tirkiye ber bi karesatekê ve diçe. Ji bo pêşîlêgirtina vê rewşê jî divê kes û derdorên demokrat, rewşenbîr, rojnamevan, nivîskar û gelê Kurd bi xwe bi erka xwe rabin. Ev erk jî rakirina tecrîdê ye."
Ocalan da xuyakirin kirin ku Birêz Ocalan temînata aştî û aramiyê ye û ev tişt got: "Muxatabê sereke yê pirsgirêka Kurd Birêz Ocalan e, ev yek bê şîrove û bê nîqaş divê bê qebûlkirin."
Ocalan diyar kir ku çiqas ev şer bidome, divê di heman demê de ev pirsgirêk jî bê çareserkirin û wiha dewam kir: "Heta ev şer bidome, wê dijminatiya di nava gelê Kurd û Tirk de jî girantir bibe. Bi mîlyonan mirov Ocalan weke îradeya xwe dibînin û mîmarê aştî û aramiyê Birêz Ocalan e. Piştî ku Birêz Ocalan ji dewrê derketiye û tecerîda girankirî li ser giran bûye, Tirkiye ketiye nava kaosê. Ji 5'ê Nîsana 2015'an û vir de tu agahî ji Birêz Ocalan nayê standin. Kengî li Îmraliyê derî li ser Ocalan hatiye girtin û têkiliya wî ji derve re hatiye birîn, mixabin kaos û rageşî li welatê me derketiye pêş."
Ocalan bibîrxist ku di encama şerê 40 salî de îradeya gelê Kurd derket holê û wiha got: "40 sal e di nava Tirkiyê û PKK'ê de şerekî tund heye. Bi sedan gundên Kurdistanê ji aliyê hêzên dewletê ve hatin valakirin û şewitandin. Bi dehan komkujî ji aliyê dewletê ve hatin pêk anîn. Lê belê Kurdan dest ji doza xwe berneda û di encama şerê 40 salan de Kurd bûn xwedî îrade û îradeya xwe derxistin holê. Kurd ji tunebûnê bûn hebûn. Divê her kes jî vê rastiyê baş bîbîne. Pêşengê vê dozê jî Birêz Ocalan e."
Parlementerê HDP'ê yê Rihayê Omer Ocalan destnîşan kir ku ger pêwendî bi Ocalan re bê danîn wê Tirkiye rehet bibe û got: "Hema tenê du hevokên ji Îmraliyê bên, dikare Tirkiyê rehet bike. Ji bo bidawîkirina vê tecrîdê çalakî tên kirin. Ev çalakî bi wate ne lê têra nakin. Ji bo aştî û aramiyê birêz Ocalan aktorekî girîng e. Hêzên navneteweyî jî daxilî vî karî bûne û lihevkirinek heye. Wê ev rewş rê li ber şerekî mezin ê birayan vebike. Rojeva me ya sereke bidawîkirina tecrîdê ye."…*ANF*

## Biryara Amerîkayê xizmeta terorê dike



Serokê Akademiya Siyaset û Ramana Demokratîk Dr. Fayîq Gulpî biryara Amerîka ya li dijî 3 pêşengên Kurd şermezar kir û got; "Ev biryar xizmeta terorê dike, divê hemû gelê Kurd û azadîxwaz li dijî vê biryarê dakevin kolanan."
Dr. Fayîq Gulpî derbarê biryara Emerîka ku li hemberî Hevserokê Konseya Rêveber a KCK'ê Cemîl Bayik, Endamên Komîteya Navendî ya PKK'ê Duran Kalkan û Murat Karayilan girtiye de, axivî û destnîşan kir ku pêwendiyên dewletên sermayedar ên bi hevre li ser berjewendiyane û têkiliyên Tirkiye û Amerîkayê jî li ser vê bingehê ne. Gulpî da zanîn ku biryara Amerîkayê jî di vê çarçoveyê de hatiye dayîn û got: "Tirkiye her dem xwestiye rêveberên PKK`ê teslîm bigire û PKK ji lîsteya terorê dernekeve. Amerîka jî di berdêla wê de her dem li herêmê bûye desthilatdar."
Gulpî bal kişand ku biryara destnîşankirina cihê sê rêvebirên PKK'ê di civîna navbera Tirkiye û Amerîka de li Enqereyê hetiye girtin û wiha dewam kir: "Ev biryar ne dadperwerane û ne demokratîk e. Li dijî qanunên mafê mirovan û azadiya gelê Kurd e. Sê rêveberên PKK`ê rêveberên gelê Kurd in, ji bo maf û azadiya gelê Kurd têdikoşin. Destdirêjîkirina ser wan destdirêjî kirina ser mafê gelê Kurde."
Fayiq Gulpî da zanîn ku PKK ji bo parastina mafê gelê Kurd têdikoşe û wiha pê de çû: "Tu kesek Amerîkî ne kuştine. Di şerê dijî DAIŞ'ê de xwedî rolek girîng bû û li diji çeteyên terorîst rawestiya."
Gulpî bibîr xist ku bi belge û dîmenan eşkere bûye ku Tirkiye pistgirya çeteyan dike, lewma divê Amerîka bizanibe ku ev biryar li dijî xelkê Amerîka jî ye û xizmeta terorê dike.
Serokê Akademiya Siyaset û Ramana Demokratîk Dr. Fayîq Gulpî di dawiya axaftina xwe de banga têkoşînê li tevahiya gelê Kurd û azadîxwazan kir û got: "Divê hemû gelê Kurd û berpirsên partiyên siyasî dakevin qadan û vê biryarê şermezar bikin. Her wiha li cihên ku lê dijîn li gel berpirsên Amerîkî runin û ji wan re bêjin ku ev biryar biryarek şaşe, eniya terorîstan bi hêz dike."…*ROJNEWS*

## Kî terorîst e?



Ezîz KOYLUOGLU

Hêzên Sûriya Demokratîk ji ber êrîşên dewleta tirk ya dagirker yên li ser Kobanê, Girê Spî, Tirbespiyê operasyona xwe ya li dijî çeteyên DAIŞ yên terorîst rawestandin. Dema operasyona xwe ya li ser DAIŞ rawestandin, diyar kirin ku ew ji ber bêdengiya raya giştî ya cîhanê ya li hember êrîşên dewleta tirk ya dagirker yên ser herêmên Bakûrê Sûriyê operasyona xwe radiwestînin. Ev êrîşên dewleta tirk ya dagirker yek bi mebesta temenê DAIŞ dirêj bike û bi erêkirina Ûris tê kirin. Dewleta tirk ya dagirker û Ûris li ser Kurdan ev demeke ketine nava hevbeşiyekê. Dewleta tirk ya dagirker ev ne cara yekeme ku bi mebesta dirêjkirina temenê DAIŞ'ê êrîşî Hêzên Sûriya Demokratîk dike.
Ger îro DAIŞ hê jî dikare êrîşan li Iraq û Sûriyê bike, sedema vê jî piştgiriya ku ji dewleta tirk digire ye. Ger îro DAIŞ hê jî hin herêman di destê xwe digre û dikare herêmên di destê xwe dem fireh bike, ev jî dîsa ji ber piştgiriya dewleta tirk ya dagirker e. Ne tenê weke îdîa ez vê dibêjim, di raporên dewletan de jî ev bi zimanek vekirî tê gotin. Dezgeha Zanyarî ya Hollanda di rapora xwe ya dawî li ser DAIŞ'ê de eşkere dibêje ku erdnigayariya Tirk ji bo DAIŞ xwe birêxistin bike, weke hêlîneke. Dewleta tirk caran hin kesan bigre jî, ev kesan demek direj girtî namînin û dîsa tên berdan. Lewre dewleta tirk DAIŞ'ê ji bo xwe wek metirsî nabîne.
A rast ne DAIŞ ji bo dewleta tirk buye komeke çete ku li dijî kê bixwaze bikarbîne. Berî niha jî diyar bû ku DAIŞ'ê êrîşên li Tirkiyê yên li dijî demokrat û Kurdan û dîsa yên li Ewropa bi fermana Erdogan pêk anîbû. Berî niha jî min di gelek nivisên xwe de diyar kiribû ku, DAIŞ jî beşek ji rêxistina Birayê Misliman e û serokatiya wê ya demê Erdogan dike.
Raporên di derbarê DAIŞ'ê ya ji bo Kongra Dewletên Yekbûyî yên Emerîka ve hat peşkeş kirin de, sedema heta niha tine nekirina DAIŞ'ê li Sûriyê bi dagirkirina dewleta tirk ya Efrînê ve hat rave kirin. Di vê raporê de tê eşkere kirin ku hebûna çeteyên terorîst yên herî metirsîdar li ser cîhanê didome. Çavkaniya van metirsiyan jî di raporên ku rayedarên dewletan pêşkeşî meclîsên xwe dikin de, eşkere dibêjin dewleta tirk alîkariya DAIŞ'ê dike.
Ev rastiya Erdogan û DAIŞ wê heta kengî ji nedîtî ve were?
Xuya dike hê jî karên hêzên cîhanî bi Erdogan û dewleta tirk ya dagirker neqediya ye. Yên DAIŞ avakir û heta îro piştgiriyê dikin li ber çavan be jî, herkes ji nedîtî ve tê. Lê lehengên Kurd yên li dijî terora DAIŞ'ê şer kirin, bi sed hezaran sivîlan ji DAIŞ rizgar kirin, wek terorîst tên binav kirin û ji bo wan pere tê diyar kirin. Dewletên Yekbûyî yên Emerîka ku çend roj berê ji bo kuştiyan sax dijî lehengên ne tenê Kurd, mirov dikare beje lehengên rûmeta mirovahî parastin, lêgerîna bi pere da destpêkirin. Ev biryara DYE ya ku dibêje ez li dijî DAIŞ'ê şer dikim, nakokiyek mezine.
Li vir dîsa pirsa kî terorîste? derdikeve holê.
Yên li dijî terora DAIŞ'ê şer kirin û bi sed hezaran sivil rizgar kirin terorîst in, an yên di raporên dewletan de jî eşkere tê gotin ku hêlîna terora DAIŞ û nahêle DAIŞ ji holê rabe dewleta tirk û dîktator Erdogan terorîst e?

## Biryar, îradeya gelê Kurdistanê dike hedef




PYD'ê diyar kir ku biryara DYA'yê bi kêrî rêxistinên terorê; DAÎŞ, El Nûsra, Hûras El Dîn û Partiya Îslamê ya Turkîstanê yên li Sûriyeyê tê ku ev rêxistin fermanê ji Enqereyê digirin.
Meclîsa Giştî ya Partiya Yekîtiya Demokratîk PYD'ê li ser biryara rêveberiya DYE'yê ya li ser 3 şoreşgerên pêşeng ên tevgera azadiyê ya Kurdistanê daxuyaniyeke nivîskî da. Di daxuyaniyê de hate gotin, "Eşkere ye ku PKK tevgereke Kurdistanî ye û ji bo çareseriyeke wekhev a meseleya Kurd tevdigere. Eger DYA dixwaze şerê li dijî terorê bike, krîzên Rojhilata Navîn ên mîna Sûriyê çareser bike û atmosfereke ewle biafirîne, divê were dîtin ku daxuyaniya Wezareta Karên Derve ya DYA'yê li vê armancê nayê, krîzê mezintir û xetere dike."
Meclîsa Giştî ya PYD'ê bi bîr xist ku ewlekarî û aramiya Rojhilata Navîn bi çareseriya meseleya Kurd dibe û diyar kir, di demeke wiha de ku çareseriya meseleya Kurd xwe ferz dike, Wezareta Karên Derve ya DYA'yê li ser sê kadroyên pêşeng ên PKK'ê biryareke wiha da. Di daxuyaniyê de hate gotin, "Di nava sîstemên totalîter de ku bi rê û rêbazên li dijî îradeya gelan tevdigerin, jiyana hevpar, biratiya gelan û çarenûsa hevpar nîne. Wekî din, li pêş çavan e ku sîstemên bi vî rengî bi rêxistinên terorê tevdigerin û destekê didin wan.

**BIRYAR DÛRÎ RASTIYÊ YE**

Bi navê Meclîsa Giştî ya PYD'ê em dibînin ku ev biryar siyasî ye, ji rastiyê dûr e û zemîneke xwe ya hiqûqî û civakî nîne. Biryar li gotinên nefretê û çanda hilweşînê tê. Biryar bi kêrî rêxistinên terorê; DAÎŞ, El Nûsra, Hûras El Dîn û Partiya Îslamê ya Turkîstanê yên li Sûriyê tê ku ev rêxistin fermanê ji Enqereyê digirin. PKK'ê li Şengalê li dijî terorê şer kir, li Hewlêrê, Kerkûkê, Kobanê bi hezaran sivîl parast û ji bo destpêkirina şerê li dijî terora DAÎŞ'ê bi roleke mezin rabû. Lewma ev biryara DYA'yê helwesteke hevgirtî nîne, nakok e. Şervanên YPG û YPJ'ê bi desteka Koalîsyona Navneteweyî ku DYA pêşengiyê jê re dike, terora DAÎŞ'ê anîne ber qedandinê.

**BIRYAR BANDOREKE NEYÎNÎ LI ŞERÊ LI DIJÎ TERORÊ DIKE**

Eşkere ye ku PKK tevgereke Kurdistanî ye û ji bo çareseriyeke wekhev a meseleya Kurd tevdigere. Eger DYA dixwaze şerê li dijî terorê bike, krîzên Rojhilata Navîn ên mîna Sûriyê çareser bike û atmosfereke ewle biafirîne, divê were dîtin ku daxuyaniya Wezareta Karên Derve ya DYA'yê li vê armancê nayê, krîzê mezintir û xetere dike. Her wiha meseleyên ku divê werin çareserkirin dixin ser rêya şaş û bahaneyan dide Enqereyê ji bo dijminatiya xwe ya li gelên herêmê bi taybetî li gelê Kurd zêde bike û polîtîkayên qirkirin û asîmîlasyonê bimeşîne. Ji tecrûbeya 7 salên bihurî tê dîtin ku Enqere û rêxistinên terorîst weke hev in. Biryara ji aliyê DYA'yê ve hatiye dayin bandoreke neyînî li şerê li dijî terorê dike.

**BIRYAR, GELÊ KURDISTANÊ DIKE HEDEF**

Em bang li DYA'yê dikin ku bi erk û berpirsyariya xwe rabe, zextê li Enqereyê bike û ji bo pêvajoya aştiyê ya ji ber helwesta dijminane ya rejîma Tirkiyê sekinî ji nû ve dest pê bike, bikeve nava liv û tevgerê. Ev biryara li dijî PKK'ê, îradeya gelê Kurdistanê dike hedef.
Bi navê partiyeke ku li Sûriyê ji bo çareseriya meseleya Kurd û pêkhatina demokrasiyê dixebite, em bang li hemû partiyên Kurd, hemû hêzên welatparêz ên demokrat ên li Kurdistan, Sûriye û Rojhilata Navîn, rêxistinên mafên mirovan û civaka sivîl dikin, ku li ber êrîşên li ser gelê Kurd rabin û ji bo çareseriya meseleya Kurd bi hev re bixebitin û têbikoşin."



# Şengaliyan biryara DYA'yê şermezar kirin

**Biryara DYA'yê ya li ser 3 kadroyê pêşeng ên PKK'ê li Şengalê jî hate şermezarkirin. Sazî, meclîs û rêxistinên li Şengalê diyar kirin ku PKK'ê di ber axa Êzidiyan de bi sedan şehîd daye û gotin, "Ev biryar wê têkoşîna me qels neke, wê bibe sedem ku têkoşîna me xurtir bibe."**



Biryara DYA'yê ya li ser sê rêveberên pêşeng ên PKK'ê ji aliyê sazî, meclîs û rêxistinên li Şengalê ve hate şermezarkirin. Sazî û rêxistinan diyar kirin ku PKK'ê di ber axa Êzidiyan de bi sedan şehîd daye.
Biryara DYA'yê ya li ser 3 kadroyê pêşeng ên PKK'ê li Şengalê jî hate şermezarkirin. Saziyên li Şengalê li ser mijarê daxuyaniyeke hevpar weşandin û biryar şermezar kirin.
Daxuyanî wiha ye:
"Bi navê gel û saziyên Şengalê, em biryara DYA'yê ya li ser 3 têkoşerên Kurd bi tundî şermezar dikin.
Me di dema şerê DAÎŞ'ê yê sala 2014'an û rojên fermanê de helwesta DYA'yê ya li pêşberî civaka Êzidî dît. Niha jî em helwesta DYA'yê ya li dijî 3 têkoşerên Kurd dibînin.
DYA'yê heta niha li dijî êrîşên li ser gelê me helwest nîşan neda. Lê belê bi saya destwerdana 3 rêveberên PKK û KCK'ê, gelê Kurd bi rengekî bêhempa têkoşiya. Di oxira jin û dayikên me de bi sedan şehîd dan.
DYA li şûna ku biryareke bi vî rengî ya pêkenok bide, dikarîbû bal bikişanda ser azadkirina bi hezaran Êzidiyên di komkujiya 2014'an de hatin revandin.
Bi navê gelê Şengalê em dixwazin vê yekê careke din bêjin, ev biryar wê bi kêrî dijminên gelê Kurd bi taybetî dijminên civaka Êzidî were.
Her ku rojên reş bên bîra me, em ê bi hemû hêza xwe bi nêrîna azad û lîderên xwe yên têkoşer re bin. Ev biryar wê têkoşîna me qels neke, wê bibe sedem ku têkoşîna me xurtir bibe."

## Derbarê DAIŞ'iyên girtî de civîn hat lidarxistin



Buroya Têkiliyên Derve ya Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji bo nîqaşkirina rewşa çeteyên DAIŞ`ê yên biyanî ku li gel QSD`ê girtî ne, 7`ê Mijdarê bi şandeyeke diplomasiyê ya Amerîkayê re civiya.
Şandeya Rêveberiya Xweser ji hevserokê Buroya Têkiliyên Derve ya Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê Ebdulkerîm Umer, cigirê wî Fener El-Keît û Endama buroyê Raniya Xelîl pêk hat. Şandeya diplomasiyê ya Amerîkayê jî ji nûnerê buroya serokatî ya taybet a Koalîsyona Navneteweyî ya li dijî DAIŞ`ê William Robak û Endamê Wezareta Karên Derve yê Amarîkayê Max Martin pêk dihat.
Li gorî daxuyaniya Buroya Têkiliyên Derve ya Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê, her du aliyan rewşa çeteyên DAIŞ`ê yên biyanî û malbatên wan ên li gel QSD`ê girtî ne, nîqaş kirine. Lê derbarê hûrguliyên civînê de tu agahî nehatin parvekirin.
Daxuyaniyê de hate diyar kirin ku divê çareseriyeke guncaw ji bo çeteyan û malbatên wan were dîtin.

## Rojnemevan parêzvanên rastî û destkeftiyên şoreşên ne

Melek DEMÎRTAŞ



Di dema dawî de leşkerên dagirkeriya Tirkî êrîşî Girî Sipî, Teberspiyê, Serê Kanîyê û Kobanê kirin. Di encam de sivîl, zarok û rojnamenav hedef girtin. Girêdayî mijarê Rojneman nerînên xwe bi Rojnema ya mere parvekirin û gotin bi hedef girtina Rojnemevanan nikare têk çûn û qirêjiya xwe parçîn bike."

**ERDOGAN DÎXWAZE TÊK ÇÛNA XWE PARÇÎN BİKE**

Rojnamevana Ajansa ANHA'yê Şînda Ekrem da zanîn ku êrîş dagirkeriya Tirkî ji destpêka şorteşê ve êrîşî projeya Netewa Dîmokratîk dike û wiha got: "Êrîşên di dema dawî de berdewamiya wan erîşa ne. Ji ber ku Tirkî çi di milê demoqrasî, siyasî û aborî de di aloziyek mezin dijî, ji bo wê jî dixwaze nakokî û pirsgirêkên xweyî hundirîn derxîne derve. Çeteyên DAIŞ'ê li Dêrazorê li himberî berwxedna QSD'ê têk diçin dixweze tolêhilîne û nefesekê dibe çeteyan."
Şînda da zanîn ji ber ku rojnemevanên li Bakur xwestin rastiya li Tirkiyê, faşîzmeya Erdoxan derxînin niha bi sedan rojnemanav di girtîhega tirkiyê dene û wiha dom kir: "Rojava, Girê Sibî û Kobanê jî bûne hardefa Erdoxan di encma rîşê de zaroka bi navê Sara û sivlî jî şehîd bûn, jiber ku herdu Rojnemevanê ANHA'yê xwestin faşîzmeya Erdogan ji raya giştî re derxînin bûne hedefa heman êrîşê."

**BÊDENGÎ HEVKARÎ YE**

Nûçegihana JINNEWS Şêrîn Zêrivan jî êrîşên dagirkeriya Tirk li dijî herêmên Bakurê Sûriyeyê şermezar kir û wiha got: "Êrîşên Tirkiyeyê di çarçoveya hedefgirtina projeya Neteweya Demokratîk de pêk tên û bi hedefgirtina rojnamevanan vê yekê piştrast dike ku hewl dide sûcên xwe veşêre û alîkariya xwe bi çeteyên DAIŞ'ê re berdewam bike."

**KAMÊRA Û PÊNÛS RASTİYÊ Jİ HOVÎTİYÊ NATİRSE**

Nûçegihanê Ajansa ETKÎN Welat Denîz balkişand li ser êrîşên dewleta Tirk li dijî rojnamevanan û wiha got: "Rojnemevan jî berwxedaniya jin û ciwanên şoreşê ku li cîhanê bûye mînak, di heman demê de rûreşiya çeteyan û hevlarên wî taybet pilan û qirêjiya Erdoxan û têkiliyên wî bi çteyan re jî raya giştî re derdixin ber çav. Ji bo wê jî her rojneman dibin hedefa êrîşa faşîzmeya dagirkeriya Tirkî. Lê bila zanibe tucarî kamêra û pênûsa Gulberelî, Dênîz û Dêlîşan çêbûn li erdê neman, emê her rastiya Erdogan û hevkariya wî ji raya giştî re derxînin holê."

## FENER
## Encam topa gindir e



Idrîs HENAN

Gelê ku xwedî li şoreşgerên xwe derkeve, gelekî zindî û jîndar e. Dema gotinfiroş, hizirmendên nola kondirên vala û aqilfiroşan derbas bûye. Ferdên ku bi dilbirê ji bircekî belek aqilmendiyê dikin û tiliya wan di bin kevirekî Kurdistanê de birîn nebûye, nabin jêderên hişmendiyê. Xwedîderketina li lîderên şoreşger derveyî partîtî û çarçoveyên teng ên netweperestiyê, erek, peywir û şertekî welatparêziyê ye. Her gotin û pratîka derveyî van rêgezan qirecira badilhewa ye.
Bi pêşketinên leşkerî û siyasî yên li Rojhilata Navîn re, ziraviyên komploya navneteweyî ya li dijî îradeya gelan ronî dibin. Dibe ku ew ziravî gelek rengên bi işiq û xweşik, di bin siloganên berz de biçim girtibin. Lê di cewher de sofîstîzma çors a bi rêbazên hîle, dek û dolaban û bi mentelîteya pirbêjiyê hewl didin hawirdora xwe bi derewan îqna bikin. Ev rêgeha ramyarî bi dirêjahiya dîrokê re ji bona avakirina sîstemên zalim bûye bingeheke felsefîk û di şiklê celadên heyî de bi awayekî pir xirab xwe daye der. Ger em çavekî bi lez li pêşketinên vê dawiyê li ser qada Sûriyê bixin, em ê ziraviyan bi awayekî qalind bibînin. Di heyama aloziya Sûriyê de, ji bona ku îradeya gelan li herêm û Sûriyê bête pelçiqandin hinek itîfaqên hêzan çêbûn. Li aliyê başûrê Sûriyê bi itîfaqa Rûs-Amerîka re dergûşa Şoreşa gelan a Sûriyeyê Deraa hate radestkirin. Beriya wê; bi itîfaqên parçeyî yên navbera Tirk- Rûs- Îran û rejîma Baas de li navenda Sûriyê Humis û Hemayê itîfaq û radestkirin hebûn. Her wiha li taxên mezin ên paytexta Sûriyê Şamê de (Gota, herdu Qelemûnên rojhilat û rojava,… hwd) teslîmkirinek hebû. Perelelî van hemû itîfaqên xiniz li eniyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê berxwedana gelan di şexsê Efrîn, Reqa, Dêrazorê de li dar bû. Ji bona ku vîna gelên Sûriyeyê ku di şexsê gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê de xwe komî hevkiriye ji nav bibin, berê xwe bi itîfaqeke din a qirêj dan Efrînê. Beriya wê xwestin hêz û îradeya siyasî li wê herêmê teslîm bigirin û dejenere bikin. Di pêvajoya şoreşa Sûriyê ku bi demê re şiklê aloziyê girtiye de, êriş û hewldanên di vî alî de ranewestiyan. Her bi hevbeşbûna îradeya gelan têk diçûn. Îro jî, bi taybet piştî têkçûna îradeya li deverên din ên Sûriyeyê hatibû avakirin, dixwazin vîna binyad di şexsê şoreşa Netewa Demokratîk a Rojava, Bakur û Rojhilatê Sûriyê de têk bibin.
Ev hewldan bi dilê hemû hêzên mudexeleker re pêkan bûye. Ji bilî vê yekê mirov nikare tu maneyê bide êrişên hovane yên dewleta faşîst a Tirkiyê. Rûsya ji ber pêşbirka hêzê û xwesteka wê ya avakirina terazûyekî nû ji hêzê re, li tevahî duanyayê şerê Amerîka dike. Ji aliyê xwe ve Amerîka ji bona ku hegemoniya xwe ya ceostratejîk ji dest nede, bi rêbazên çewsîner ên bazirganan siyseta çogkirinê (sezayên aborî, siyasî, îzolekirin,… hwd) li hemberî dijberên xwe dimeşîne. Ewrûpaya ku êdî xeyal dike derveyî vê hegemoniyê artêşeke xwe ava bike, di nav îxaneta ji nirxên xwe re fetisiye ku êdî êsîrê modela liberal a bêqîmetkirina mirov û civakan e. Ji ber van taybetmendiyên xwe yên xwe dispêrin zihniyeta istimlakê îro çep û rast seza û baxşîşan belav dikin. Lê êdî dem di ser van kiryaran re derbas bûye û gelên herêmê bûne xwedî îradeya azad a afrîneriyê. Dîrok dibêje ku rêbazên şantaj derfetên awantajê jî ji dest didin. Wê encam jî nola topa şeqê ber wan ve bigindire.